

BI MEŞ JI AMÛDÊ TA QEREQOY

Canşêrê Sinceqê



Ebdlrezaqê Hec Qasim digot: Gava min xebera **BAVÊ ŞIYAR** ,xebera reş bihîst ,min behwer nekir lê mixabin ,ne derew bû. Wê gavê , weke benek li qirika min bête gerandin..Ba ji ser min qut bû , dinya li ber çavê min sor û reş bû... **Bavê Şiyar** , çawa te barkir ? Çire te barkir?.

Bavê Awaz berdewmkir: **Bavê Şiyar**,Mamostê me bû ,û bi taybet ,mamostê min bû û ji biçûkaniya xwe ve min nasdikir...Bersiva her pirsekê li ba wî hebû bihna wî teng nedibû, heskirinê ,tim û tim ,ji çavên wî yên dilovan bang mirov dikir û dengê wî yê nerm, bayekî hênik,bi ser sînga mirov de,berdida..**Nemir**, Dara vehesa me bû ,ji şewata kul û derdên vê jiyana bêbext , em dibezîn ber siha wê darê ,û ji teyrok û seqemê jî em diparastin.

Ji roja Duşemba reş 18-10-2010an ,ta Çil-rojiyê-roja Înê 26-11-2010an, Mamoste

Îsmayîl Umer , li ber çavê Ebdirezaq ,diçû-dihat û ji bîrê nedîçû.....

Bavê Awaz , li kat 2;30ê berî berbanga Înê 26ê Çirya paşîn ,hêrsê eşqa **Mamoste** dayê , û ji nişkave hilçenî, cilê xwe wergirtin,kurk bi serde , neh-deh pakêt çixare,û solên xwe kirin pê, derket û deriyê hewşê li pey xwe girt....

Amûda şewitî hîn di xew de bû..Berê xwe da riya Dirbêsiyê ,, gundê **Qereqoyê**,yê ku,tirba Pîroz lê ye.

Bavê Awaz –ew kalê pêncî salî- wê çel pênc an pêncî k/m ji Amûdê ta Qereqoyê bide bin ligan,

Kalê Amûdê,wê berbangê,bi sitêrkên ezmanê Cizîrê re , dimeşî û dipeyivî , sitêrka sibê şerm û fedî dikir, ji ber ku, sitêrka **Qereqoyê** jê geştir û rewşentir bû.

Bi melûnbûna çirayên Mêrdînê û hilavêtina tîrêjên roja Payîzê ser keleha wê re,lawê Birahîm nêzikî Dirbêsiyê bûbû, û ,heft newal û heşt gir dabûn pişt xwe.

Li nav bajarê Dirbêsiyê ,rêwî dimeşî, xuşxuşa pelên darên payîzê û kela dilê wî ,simfûniya mirin û jiyanê li hev tanîn.

Rêwî, meşa xwe ta **tirba pîroz** berdewamkir, û kela ber serê **BAVÊ ŞIYAR** hembêzkiir û got: Eger min dengê te bibihîsta, ezê herroj ji Amûdê bi meş bihatame ba te.

Qamişlo—27-11-2010

Têbîn: Rêz û hurmet ji komîta NEWROZê re. Bi hêvî me , vê carê navê min (((CANŞÊRÊ SINCEQÊ))) rast bête nivîsîn. Dîsa nebe , Canşêrê cinciqî. Ji ber ez pir ji cinciqan heznakim...Spas.